



Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji
weşanên
Partiya
Yekîti ya
Demokrat
a Kurd li
Sûriyê -
YEKÎTÎ*

Xebat ji bo :

- * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
- * Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
- * Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

**Ji konferansa rêxistina Ewropa ya parta
Yekîti ya demokrat a kurd li Sûriyê re....**

Mîvanên rêzdar ...

Endamên birêvebiriya konferansê...

Hevalên hêja...

Silavên biratî û hevaltîyê ji we re hene, hêvî ew e ku, karûbarê vê konferansa we ya pîroz û bi rêkûpêk biçê serî û serkeftî be, û li ser riya xebata di ber gelê Kurd de li Sûriyê pêngaveke erênî, kêrhatî û nûjen be.

Û hêjayî gotinê ye ku, lidarxistina ewqas konferansên şax û rêxistinan li gelek welatên Ewropî û helbijartina nûner û komîteyan bi şêweyeke demokratîk -li gor tozîkê- ciyê şahî û pîrozbahiyê bû. Lewre jî, bawerî li cî ye ku, hûn dê karibin bi hev re, mil li mil, xebata xwe bidomînin, berfirehtir û geştir bikin, û li ser xal û jêderên xemsarî û kêmasiyan rawestin, da ku çareseriyên jê re bibînin.

Beşdarên birêz...

Hûn baştir dizanin ku, çendî rewş û heyam li Ewropa û Sûriyê di hemî waran de ji hevdu cuda û tersî hev in, lewre jî, pêdivî ew e ku , hemî xebat û çalakiyên we di çarçewa rêzgirtina zagon û qanûnên wan dewletan de bin, da ku dostanî, D.R. 11

Deng û Tîp

Memê Alan

3

**Dibistan
Têrm û têgeh**

Heyder Omer

4

STÊRK

Nûredîn Êsîf

6

Nûseyaya xwendekaran

Anahîte Mûrad

9

Nûçe û Calakî

Nûçe û Çalakî

Birûskek Pîrozbahiyê

Seyadayê Cegerxwîn dibêje: *Dermanê me ye xwendin û zanîn...*

Xortên xwendevan, tev bûn Cegerxwîn...

Her bijîn, bijîn xortên nûhatî...

Her bijî, bijî Kurdistan herdem...

Bi dilekî geş û şad me nûçeya serkeftina keça xwendekar a Kurd Canda Welîd Bînbaş bihîst. Canda Welîd Bînbaş hemû ezmûnên xwendegeha bilind (Bekelorya/Abitur) li Elmaniyayê bi qezencek mezin û bilind kuta kir û rêya çûyîna Zanîngehê ji xwe re vekir. Em bi navê hevalên şaxê navend û başûrê Elmaniyayê yê Partiya Yekîtiya Demokrat a kurd li Sûriyê - Yekîtiya - Ji dil pîrozpahiya wê dikin û serkeftinê bo wê û hemû xwendekarên kurd ên li mişextgehê û yên li welêt dixwazin.

Şaxê navend û başûrê Elmaniyayê ya PYDKS – Yekîtiya

Nama Zanîngeha Helebê

1 -Li 10-06-2009z, ji ber ku gelek xwendekarên kolîca toreyan a zanîngeha Helebê fitka terxandina salane bi xwe re nebiribûn ezmûnê, wê lomê rê nedan bêtirî 500 xwendekarî ku ezmûna xwe bikin. Ew bûyera kirêt bû sersedema xirecîrek mezin li zanîngehê. Hêjaye ku em bibêjin- wek ku xwendekar dibêjin- ku cara yekeme ev fitik dibe sersedema bidûrxistina xwendekaran ji ezmûnên wan.

2- Di encama sekna 12ê Avdarê de, encûmena serokatîya zanîngeha Helebê ev sê xortên jêrîn ji zanîngehê qewtandin: 1- Alan Huseynî 2- Kawa Dîko 3- Evdî Remî.

Herweha agahiyek tekoz giha me ku. 120 xwendekarên Kurd bi qewtandinê hatin

azardan di bin navnîşana ku ew bûne sersebeba peydakirina fewdalîzmê di zanîngehê de.

Du Şev Helbestî

Komîta çalakî û şevbihêrkan li bajarê Helebê du şev helbesta Kurdî girêdan. Mîvanên hedu şevan ev helbestvanên Kurd, Awzê Kalo, Sêwiyê welêt, Bahoz, Nehrî, û di gel giropek ji rewşenbîr û evîndarên ziman û helbesta Kurdî bûn. Herdu şev bi hin helbestên tijî hesten nazik ji bal wan helbestvanan ve hatin xemilandin. Herweha bi pirs û vepirsînên wan beşdarên hêja ew şev zengîn bûn.

Girtiyên Newrozê

Weke agahiyên li ba me kombûne xuya bû ku hejmara girtiyên Newrozê (20+21) li bajarê Heleb giha derdora 120 kesan ji wan girtiyan çendek Ereb, û 17 kes kêmtirî temenê zagonî bûn. Ên biçûk ji zîndanê hatin berdan û ji derve ve, ji aliyê dageha tewanbariya biçûkan ve tîn dadgehkirin. Herweha li 20-05-2009 an jî 35 hatin berdan, û ta nuha dora 67 kesan hîn di zîndanê de ne, û tu serdan ji aliyê xwediyên wan ve ji wan re nebûne.

Komîta rêvebirîya Newrozê van ton biryarên kirêt ji aliyê encûmena serokatîya zanîngeha Helebê ve, di dermafê xwendekaran û bi taybetî yên Kurd de û herweha van girtnên bi awakî tewşankî û nemaftdar çêbûne û çêdibin şermezar dike, û doza vegera xwendekarên qewtandî û berdana girtiyên mayîn ji berprsiyarê deslata dewletê dike. Ji ber ku ev kiryarên weha nerindî, zikreştî û nakokiyê diçînin .

Deng û Tîp

Memê Alan

Bi Kurtî, di zimanzaniyê de, deng weha şirove dibe; Ew bayê ku ji pişka mirov derdikeve, diçe qirikê, û li wir bizavekê dide, û paşê ew deng bi alîkariya qirik, lêv diran, ziman, ezmandev, û difina mirov durveke taybet distîne. Deng bi xwe jî du bir in: Birik jê bi awakî yekser, rasterast û bê sekin ji devê mirov derdikeve, ji wan re bideng tê gotin, lê, yên bêdeng, nikarin bê alîkariya bidengan û bi serê xwe, ji devê mirov derkevin. Yanê, ta ku miriv wan bi lêv bike pêdivî bi bidengekê heye. Di zimanê Kurdî de, 31 dengên bingehîn hene. Ji wan 23 deng bêdeng in, û 8 bideng in. Lê hêjaye were gotin, ku hinek deng hene jî jê re rengedeng tê gotin, yanê pirdeng in.

Tîp jî nîşandekên dangan in, yanê bi alîkariya wan dangan tene nimandin. Herwekî berê me xuyakiribû, ku zarava Kurmancî ji 31 dengên bingehîn pêk tê, li nik wan dangan jî, 31 tîpên bingehîn tene nîşandan. Lê gelek rengedengên dî, mîna Ç, T, P, K, L, R, N û dengên (ع), (ح) û (غ) yên ji zimanê erebî derbasî Kurdî bûne û nêzîk wan dengên Kurdî mîna (H, X), hîn şirovekirin li ser wan berdewam e, û lihevkerinek giştî pêk nehatiye.

Yanê di Kurdî de hinek deng hene- tevî ku abeya Kurdî wekî abeyeke fonotîk e (ji bo her dengekî tîpeke) – ji wan re tîp diyar nebûne. C. Bedirxan, ew deng weke rengdeng dîtine û tu nîşan jê re diyar nekirine. Hêjaye em bibêjin, wê hingê apê Osman Sebrî li dijî wî derket û du niçik danîn ser ên nerm, bi wî şeweyî ew rengedeng dan nîşandan û tîpên Kurdî zêde kirin. Niha jî hine kes dixwazin bi awakî van di nava abeya Kurdî de bi cî bikin.

Di vê xebatê de, emê dibînin ku rêça C. B qelaştî emî bigirin û hîmê wî daniye em

hilnaweşînin, ta ka saziyeke hevgirtî ya Zimanê Kurdî pêk were, û lihevkerineke giştî çêbibe. Ji ber ku em rê nadin heryekî ku bixwaze li ser navê serastkirinê û di bin navê lîkolîneriyê de pihînekê li wê avahiya zimên ya dîrokî de. Li alîkî din jî herkesek hewldide ku hejmara tîpên xwe kêm bike, û abeya xwe hêsan û sivik bike, vêja pêwîste em jî li ser şopa hêskirinê bimeşin. Û ji ber ku di Kurmancî de, dengdar li gor cihdera dangan, şeweya derketinê, û asta derketina wê ji hev vediqetin. Di baweriya me de divê rengedengên me bi navkirine di abeya Kurdî de, bi tîpan neyêne nîşandan. Tenê di perwerdehî û lêkolînê de mirov dikare wan bi awakî ji awan nîşan bide. Bi dîtina me be, nîşandana wan rengedengan bi tîpine din cuda ji yên berê ji bo zimanê me bargiranî ye. Lê hêjaye em bêjin ku ta niha, tu lêkolînên zimanzanî yên fereh û kûr di dermafê zimanê me de tune ne. Tiştêkî neguhêrek tune ye, û zimanê me jî yek ji wan tiştên guhêrek e. Wêlomê pêşketina wê jî bi hewceyî lêkolîn û nêrînên zanistî ye. Lê çi biryarên guherînê di paşerojê de, di zimên de çêbibin bi hewceyî lihevkerinên giştî û biryarên saziyên zimanewî ne.

Pîroz be

Piştî 73 roja n ji binçavkirinê, roja Çarşemê 17-6-2009 an, Rojnemevanê Kurd Faroq Hecî Mistefa ji zîndanê serbest hate berdan .



Daristan Sermiyan e

Hêvî ew e ku haya xelkê me ji şewtandina daristan û zeviyana hebe. Wêlomê avêtina dûvikên cixaran û pêxistina agirana li seyranan bi awayekî ne miqiyat ziyane digihînin vê sermiyanê.

Dibistan Têrm û têgeh

Heyder Omer

Her zimanek ji bo xwendegê, navekî bi kar tîne, wek çawa zimanê kurdî peyva (dibistan) dixebitîne. Lê tevî cirbeciriya navan jî, ewana hemî wateyekê nîşan dikin, ew jî cihê, xwendinê ye;ango peyva (dibistan) û hevwaterên wê li ba zimanên dîtir, wek têmekê, wî cihê, ku şagirt tê de dicivin, û li ber destên mamosteyan hînî xwendinê û nivîsînê dibin, nîşan dike. Lê hevwatera peyva (dibistan), ya ku di zimanê erebî de (medrese) ye, tenê li ba sînorê têmekê namîne, belê wek têgeh jî tê xebitandin.

Gava (medrese), di zimanê erebî de, ji qalîkê têrmê bi der dikeve, û wek têgehekê tê bikar anîn, hîngê wateya cihê xwendinê jî bi paş piştî xwe de davêje, û wateyêke dine nuh distîne, û dibe nîşana rêbazê xwedî bingeha ramanî. Wek çawa mirov dikare ji bo markîsizmê bibêje: Medrese (dibistan) ya markîsizmê, û ji bo felsefeyan, wek nimûne, bibêje: Medreseya Kant, an ya Sigmond Froyd, û H.W.D.

Ez nizamim, ka ev têrma, di zimanine din de, wek têgeh jî bikar tê ya na, lê di zimanê kurdî de, ez bawer im, ku tenê kurdên, ku kultura Ereban jî wergirtine, wê wek têgeh bikar tînin. Siyamend Birahîm jî ew di vê qoziyê re xebitandiyê, gava bersiva pirsekê dide û di hevpeyvînekê, ku pêre hatiye kirin, de dibêje: „.....eger tu dixwazî bi wateya ziman bigrî, ez şagirtê dibistana Celadet û Osman sebrî me“. (Biner: www.welateme.net).

Bi baweriya min, beriya mirov wê bersivê bide, divê wateya têgeha (dibistan) li pêş wî sayî be, da bizanibe, ka ew her du kesayetiyên navborî karîbûn bibine dibistan yan na, û eger bûbine dibistan, gelo ewana damezrêner û nûnerê dibistanekê ne, yan her yek yê yekeke cida ye. Eger her du dibistanek bin, wek di bersivan S. Brahîm de xuya ye, ez bawer im

Wek hatiye zanîn, C. B danerê ABC ya kurdî latînî û yê rêzimana kurdî ye. Heya îro kesekî, ku beriya wî di vî warî de xebitîye, û xwe bi pirsgirêkên kurmanciya jorîn re westandiyê, nehatiya naskirin. Her weha rêzimana wî bûye bingeha rastnivîsîn û rastxwendina kurmaciya jorîn. Di dan û standinên zimanewanî de her tim tê gotin, ku C. B weha çûye, an jî weha û weha gotiyê, lê bi carekê kesekî negotiyê, û nabêje jî O. Sebrî weha çûye, an jî weha gotiyê. Di vî warî de, carcaran, tenê navê Qenatê Kurdo li kêlek yê C. B tê hildan. Bi ser de jî O. Sebrî ti nerîn an jî pirtûkên rêzimên bi paş xwe de nehêştin; ango pirsgirêkên zimanewanî ne qisaweta wî bûn.

Tevî ku O. Sebrî ABCyek du caran jî çap kiriye, lê dîsan boçûnên wî nebûne dibistan, û nabin jî, ji ber ku wan boçûnan di nav civakê de deng venedane, û kesek ji nivîsevanan wan bikar nîne. ABC ya C. B. pêşî ji 33 tîpan pêk hatiye, ji ber ku (h') û (x') ku xalek li jora wan de heye, li gor gotina O. Sebrî, tê de hebûn, lê ew her du tîp, ku xal li jora wan e, jê hatin avêtin, û 31 tîp man. Tevî ku O. Sebrî bi wê yekê ne bawer e; ji ber ku ewî koma tîpan ji 33 bêtir dikir,(1) lê ew jî sala 1955ê ABCya xwe bi 33 tîpan çap dike, û sala 1982 careke din, lê 4 tîpên din bi ser ve dike, ew jî ev in (p' k' ç' t'), ku her yekê ji wan xalekê dide ser, ji ber ku ewana bi du awayan têne bilêvkirin. Pêre jî ABCyêke dine bi 37 tîpan dixê nav destên xwendevanan.

Tîpa dubare li ba C. Bedirxan nîne. Lewre dibêje“ Di zimanê kurdmancî de, tîpa dubare nîne. Ji lewre, heke di bêjeyekê de tîpek dubare bû, yeke wan (ango tîpek ji wan) ji ber xwe de dikeve, û tîpek bi tenê dimîne“(2). Lê O. Sebrî di ABC ya xwe de weha diçe, ku her du tîpên (R., L) têne dubarekirin, û wan bi R û L a guvaştî dinavîne.(3). Bi ser de jî . C. Bedirxan cînavê girêkî bi awayê (ko) lê O. Sebrî **D.R. (5)**

Dumahîk : Dibistan....

bi awayê (ku) dinivîsîne.

Wek tê xuyakirin, ku xebata O. Sebrî, di warê zimên de, ji vê ABCyê û dersdayînê derbas nabe. Pêre jî ez bawer im, ku her kesê ABCyekê çap bike an jî dersên zimên bide, xebata wî nikare bibe dibistan, an jî rêbazê, ku dikare rehên xwe berde nava wî zimanî û xwendevan û nivîsevanan.

Xebata C. B di vî warî de yekeke tevayî ye, li ba ABCyê namîne, belê ew hemî warên zimanewaniyê vedikole, xweristiya tîpan, dengdêr û dengdaran, vedikole, wek nimûne, gava xweseriya dengdêra (U) şirove dike, dibîne ku ev dengdêra han ji dengdarên(h, g, k, q, x) pêve nakeve paş dengdarine din, lê hatina (u) di pey (d , t) re , ango (du , tu), li gor boçûna C. B, awarte ye(4). Bi ser de ji C. Bedirxan hemî beşên zimanewanî û hevسازیya hevokê û bêşên gotinê şirove dike. Hema bi kurtahî, mirov dike bibêje, ku ewî hemî warên sêmantîk, morfologî, fonîtîk şirove kirine. Dêmek, cidahiyeke mezin di navbera nerînên her du kesayetiyên de heye. Herdu jî vêkra, bi sedema vê cidahiye, nabine damezrêner û nûnerên dibistanekê. Bi ser de jî, wek me li jor gotiye, boçûnên O. Sebrî nikarin bibin dibistan bi wateya têgeha ramiyari, lê mirov bê dudilî dikare helwest û boçûnên C. Bedirxan wek dibistanekê binavîne.

Eger ji vê bi şûnda, Siyamend Brahîm li nivîsên xwe vegere, dê bibîne, ku ew ji kaniya C. Bedirxan vediwe, û qet xwe nêzîk boçûnên O. Sebrî nake, ji ber ku ew her şeş tîpên (Ç', h', k', p', t', x'), ku O. Sebrî bi ser ABCyê de kirine, di nivîsên xwe de naxebitîne.

Ev yeka dide xuyakirin ku, ji hêlekê, haya wî ji xwe nebûye, û ji hêla din de ew têngihîştîye ku peyva (dibistan) wek têgehekê çî wate heye. Mixabin, Siyamend Brahîm di wê hevpyvîne de ne tenê xwe dixê vê tevliheviya beloq, belê bi ser de, hin quretiyên din jî dike.

Wek nimûne, gelekî pesna kurtepiirtûka xwe (Gulistana zimên) dide, ta radeya, ew piirtûk dibe jêdera nivîsevaniya hin nivîsevanên, ku beriya wî bi zimanê kurdî nivîsandine, lewre jî dibêje „ Piirtûka min Gulistana zimên gelekî nav daye, û gelek xortên ji wê xwendin bûne nivîskar, wekî Xalid Mihemed, Konê Reş, Dildarê Mîdî“. Min ev kurtepiirtûka vî camêrî ditiye, û xwendiyê jî. Ew bi xwe mîna ABCyekê ye, di dawîya salên heştê an jî destpêka nodiyên çerxa çûyî de çap bûye, qulafetê wê ne mezin û ne orte ye, belê biçûk e, rûpelên wê hindik in, min ji bîra kirî, ku çendin, lê nagihînin 70î, dikare mirovê ku zimanê kurdî nizane, hînî ABCyê û hin gotin û hevokên gelekî sade bike. Lê bi carekê nikare nivîsevanan peyda bike.

Ev yek. Ya duduwa ew e ku , Konê Reş bi temenê xwe yê biyologî û yê di qada nivîsînê de têper kiriye, ji Siyamend Brahîm mezintir e. Hema ya ku ez dizanim, ew ji beriya 20 sala de bi kurdî dinivîsîne, di destpêka salên nodî yên çerxa çûyî de kovara Gurzek gul derdixist; ango di dema derçûna kurtepiirtûka S. Brahîm de. Her weha tê bîra min, ku Dildarê Mîdî sala 1994ê helbestên xwe, roja mehrecana duwem ya helbesta kurdî, xwendin. Lê Xalid Mihemed nasnakim, tenê li guhê min ketiye, ku piirtûkên wî bi zimanê erebî, û bi awayê akadêmîk, û fernengeke wî ya kurdî-Erebî hene. Gelo heşê mirov dipejirîne ku ev kesan şagirtên S. Brahîm bin?!

Mixabin, mirovin hene nizanin, ku gotinên girs nikarin kesekî mezin bikin, lê dikarin wî zû biçûk bikin. Çima evqas qurefî!..

(1) Biner: Osman Sebrî. Pêşgotina Elifbêya Tekûz. Cih û nimra çapê nediyar in. sal 1982

(2) Mîr Celadet Alî Bedirxan: Rêzimana Kurdî. Amadekar: Behzat Batê. Çapxana Pencinar, nimra çapê nediyar e, Stockholm-Sweden 2006, rû 12.

(3) Osman Sebrî: Jêdera navborî. Rû 18, 19.

(4) Mîr Celadet Bedirxan: Jêdera navborî, rû 12.

Têbîn : Ev gotar ji entirnêtê hatiye girtin

STÊRK

Bijartina: Serdarê Bedirxan

Navîna meha Hizêranê, min di malpera nefel.com ê de, parçeyeke wêjeyî ya wergerandî, bi navnîşana "Name ji aşê min-Stêr, çîroka şivanek provenceyî" ku ji bal birêz **Husên Mihemed** ve hatiye wegerandin xwend.

Piştî ku min ev çîroka xweş û nirxbuha xwend, yekser hate bîra min ku min ev çîrok berî derdora 25 salan di **Hawrê** yan **Ronahî** yê de bi pênuşa hêja **Dr. Nûredîn Zaza** xwendiyê. Ez li Hejmarên Kovara Hawarê vegeyriyam, min ew di hejmarê 33an de, lê çiriya pêşîn 1941an de dît. Careke din, bi hûrbînî min ew xwend, ji min ve hate xuyakirin ku birêz **Dr. Nûredîn Zaza** bi navê (Nûredîn Usif) di sernivîsa çîrokê de daye zanîn ku ev çîrok ya wêjevanê Firensî yê kilasîk **Alfons Daudet** e (1840-1897). Ji bo ku ew çîrokê bêtir nêzikî hiş û warê Kurdan bike, wî navê çiyayê **Luberoll** bi çiyayê **Sîpanê Xelatê** guhertiye, navê keça axê ya bedew û çeleng **Stîfanê** jî kiriye **Mijgan**, digel hin guhertinên din, ango wî (teseruf) tede kiriye.

Ji bo xwendevanên me vê kurte-çîroka xweş a wergerandî bixwînin, min ew ji rûpelên Hawarê guhestiye ser rûpelên **NEWROZê**. Herweha, ew dikarin wergera birêz **Husein Muhammad** a hêja jî di malpera nefel ê de bixwînin. (**Serdarê Bedirxan**)

STÊRK

ADAPTATIONS DE "LES ÉTOILES"
D'ALPHONSE DAUDET

Gava li zozanên **Sîpanê Xelatê** min pezê xwe diçêrandin, carina hefteyî diborîn bêyî ko ez dengê tu insanan bibihîsim. Ez bi tenê bi hevaltiya kûçik û pezê xwe bûm. Lê, her serê panzde rojan carekê gava ji dûr ve min dengê zengilên qantirên me dibihîst ji kêfa xwe serê xwe radikir: Gundiyekî, yan kebanîya mala axê ya pîr ji min re zadê min ê panzderojî tanî.

Wê rojê, ez çîqa şa dibûm; Min ji wan nûçeyên gund dixwestin, lê tiştê ko ez ji her tiştî bêtir dilxweş dikirim pîrskirina halê **Mijganê**, **Mijgana** keça axê bû.

Bê ehemiyet min ji wan dipirsî: Gelo xanima piçûk pîr diçe dawet û şahînetan yan na? Qet

dikeve govendan? Cilên spehî li xwe dike? Eger ji min re bigotana: "Ma ji te re çî? Şivanê reben û belengaz!" Minê li wan vegeyriya ko ez gihame bîst salî û min hîn di spehîtiya wê de tukes ne dîne!

Rojêke Înê ez li benda zadê xwe bûm; Berî nîvro baraneke xurt hat. Heya piştî nîvro çavên min li rê bûn, pişt re min hêviya xwe birî û ji sêrmê ketim holika xwe. Esrê, min dengê zengil bihîst; Zûka derketim derve; Çi bibînin... bizanin kî?... **Mijgan!** Xanima min bi xwe bû...

Li ber holikê peya bû. Ji bayê çiyê hinarkên wê bûbûn sorgul. Li min vegeyriya û got: "Gundî mijûl bûn: Pîrê jî çû bû cem zaroyên xwe bavê min ez şandim..."

Mijgan, bi bejna xwe a zirav û narîn, bi çavên xwe ên çeleng û bi cilên xwe ên xemilandî û giran û giran, spehîtiya bi xwe bû. Ciyê wê bajar, xaniyên delal û îşê wê govend, reqs û stran bû, lê ne çiya, zozan, rêl û qantir bûn.

Mexlûqa çeleng! Çavên min jê ne dibûn. Cara pêşîn min ew ji pîr nêzik didît. Niha ew li ber min sekinî bû û bi tenê ji bona çavên min bû.

Dilê min hildavêt, hişê min diçû û qirika min dihat girtin.

Mijgan zad ji selikê derxist û da min. Pişt re bi nêrînên tûj li dora xwe nêrî, da ko ji giyan şil nebe hinek fistanê xwe rakir û çû holika min; Min da pê wê. Li hundir, li ciyê raketina min, li bilur, kulav û li darê min nêrî, pişt re bi dengê zîz û ahengdar gote min: "Tu li vir dijî ne? Şivanê reben! Niha tu bi tena xwe ji diltengiyê çiqas bêzar dibî? Bêje min: Tu çî dikî? Bi çî mijûl dibî û kê tîni bîra xwe?..." Minê jê re bigota; "Bi tenê te xanima qeşeng". Dilê min derew ne dikir; Lê zimanê min negeriya û ez sor bûm.

Mijgan bi eza min hesiya û xwest hîn bêtir min bêşîne, "Hevala te a delal çima carina nayê çiyê û te nabîne?". **Mijganê**, gava ev pîrs digotin serê xwe dikir paş û dikenî; Min digot qey periya spehîtiyê bi xwe ye!

Lê hatina wê weke xewnek bû. Piştî demekê gote min: "bi xatirê te şivano". Bi dilekî şikestî min jî got ê: "Xwedê bi te re be xanim!" pişt re selikên xwe ên vala avêtin ser qantirê xwe, lê siwar bû û bi rê ket.

D.R (7)

Ûsa dihat min ko her kuçê ko ji bin lingên qantir difirîn yek bi yek li dilê min diketin. Çavên min ji rê nedibûn û wek serxweşekî li ciyê xwe dinihêrtim.

Êvarê, gava pez, vedigeriyan guhê min ji kaş dengê bihîst. Gava min serê xwe rakir, min xanima xwe dîsa li ber xwe dît. Lê niha wek sibê delalî û çelengî ne dikir, lê ji tirsê dilerizî û ji sermê diranên wê dirikrikîn. Welê dixuya ko ji barana sibê çem rabûbû, Mijgan xwesti bû lê derbas be, avê bor ne da bû. Cilên wê şil bûn û çavên wê hêstir dikirin.

Hingûra şevê bû, êdî nikarî bû vegere. Min xwest dilê wê rahetbikim. Min got ê: "Çi xem e? Xanim şevên Tîrmehê kurt in, tu sebebên tirsê nînin, çavên xwe bigirî û vekî, sibê ye!" Paşê, zû min agirekî mezin dada. Mijgan sol û cilên xwe ziwa kirin. Piştê min jê re piyanek şîr, hinek penîr, nan û fêkî anîn. Lê eqlê wê ne li xwarinê bû, li hal û mala xwe digirî, bê hemdê min, çavên min jî hêstir kirin.

Bû şev. Min ji xanima xwe re di holikê de ji pûşan û ji postê berxekî paqij nivînek çêkir. Xanima min çû nav ciyan û ez li ber derî rûniştim.

Ji evîna wê, dilê min diperitî û laşê min dişewitî. Lê Xwedê dizane, tu tiştê xerab ne dihat bîra min. Çawa bihata? Keça axê min xwe siparti bû min û li bin parastîna min bû! Welê dihat min ko Mijgan di nav keriyên min û di keriyên dinê giş de miyeke tekane ye !. Min tucaran ezman wek wê şevê kûr, û stêr wek wê şevê geş ne dîtî bûn. Di canê min û di çavên min de her tişt guhêrî bûn. Çavên min bi nêrînen şaş li tiştan dinêrîn û eqlê min di ezmanên xeyalan de ajnî dikir.

Di vê gavê de deriyê holikê vebû û wek hêva çardeşevî keçika delal jê derket. Ji mayîna xwe; û ji ber nivîna ji pûş û pelaş xew lê çû bû. Hat û li ber agir rûnişt. Min kulavê xwe ji xwe kir danî ser milên wê, agir vêjand û bê deng li cem wê rûniştim.

Şev xweş û hinek hênîk bû. Di dora me de cîhaneke veşartî bê deng şiyar dibû. Di her tiştî de ez livînek dihesiyam; giya mezin dibûn, kulîlk vedibûn, meywe digihan... Dilê wan jî wek yê min hildavêt û xwîna wan jî wek ya min dibeziya... Stêr bi xwe radibûn û rûdiniştin.

Ji tevgera her tiştî ji her dengî, Mijgan ji tirsan

dilerizî û xwe li min dipêçand. Ji nişkê ve di ser serê me re ronahiyeke geş borî. Me serê xwe rakir; Stêrekê reşiya şevê çirand û ji dûrî me ket erdê.

Mijgan bi tirs pirsî: "Ev çi ye?" Min lê vegeand: "Ev giyanek e, dikeve buhuştê". Paşê min şhadeta xwe anî, wê jî şaş şaş li min dinêrî û wek min kir û pirsî "Hon şivan sihirbaz in?" Min got wê: "No xanimê! Lê em li serê çiyên nêzîkî stêran in, ji lewre em ji xelkê bajaran bêtir bi hal û sirên wan dizanin". Mijgan serê xwe danî bû ser destekî xwe û li stêran dinêrî. Gava min li rûyê wê nêrî min got qey şivana stêran e, ketiye erdê. Bi dengê heyran gote min: "Stêr çiqas pir in, çiqas spehî ne! Min ew tu caran hevqas zehf hevqas çeleng ne dîtine! Tu bi navê wan dizanî şivano?"

Çawa nizamim xanima min! Binêr! Di ser serê me re: Komika sêwiyan e, ji Rojhelat hiltê û ber bi Rojavê diçe. Hinek li Bakur, Termê Mixêl e –heft in- li rastê wan, Dûpişk e, hergav li Bakur e. Li ber me, Kakeşîn e. Hinek li çep; Kerwankuj e; wek stêrka sibehê ye. Ji lewre kerwanek pê xapiya ketiye rê, û bi şev ji sermê qufiliye. Hinek li nivro Lêl e; Dibêjin ko Lêl û Mecnûn hejî hev du dikirin lê ne digihan hev; gava mirine giyanên wan derketine ezmên, yek çûye Rojava, yek jî Rojhelat. Li Zivistanê Mecnûn li zozanan e, û Lêl li germiyan e. Havînê, Lêl tê zozanan û Mecnûn diçe germiyanan û gava ji cem hev derbas dibin digihin hev, hevdu maçî dikin û piştê her yek diçe aliyê xwe.

Di vê gavê de tiştê nerm, sivik û germ ket ser milê min. Ev serê Mijgan bû. Çîrokên min ew lorandi bûn û bê hemdê xwe ew avêti bû xeweke giran. Min qet xwe ne livand. Stêr pir diçirîsîn. Ûsa dihat min ko, cot, cot tîn min pîroz dikin, û bi ken dîsa vedigerin jor. Bi êş û keser min li Mijgan dinêrî, lê tu xerabî û pisîtî ne dihatin bîra min. Bi tenê bextiyar bûm. Min digot qey çelengtir, spehîtir û xweşiktira stêran dahatiye, xwe daye milê min û li wê vezeliyaye.

Heta derketina rojê Mijganê ez sermest hiştim. Piştê rabû, û bi dîtina rojê weke gulekê vebû û kenî. Li goman, berx dikalin, li ser zinarên bilind kewan dixwendin, li ser xwîna giyayên kesk û taze tîrêjên rojê sor diçirîsîn, û ji fikra ko ezê bextiyariya xwe winda bikim, dilê min ê reben digevizî û bi nalînen kûr û bi keser li wan, li pez, kew û çiyên vedigeriya

Zimanê Xwe Bênxir Nebînin. Nimûne "Çima Alfebe û ne abe"

Derwêşê Xalib

Di hejmara (85)(Nîsan 2009) ya weşana Newrozê de, nivîser **Memê Alan** vê pirsê dike. Di despêkê de nivîser dibêje: "Her miletekî ji tîpên zimanê xwe re navlêkirinek dît û lêkir." lê piştî çend rêzan dinivîse: " hemî (navlêkirin) vedigerin binesaziya navlêkirina Yûnaniyan".

Di baweriya min de, ev herdu hevokên nivîser nakok in. Zêdetir, xebitandina "abe" ne bi dilê min e. Lê armanca min ne ev gotar bi xwe ye, lê nîşana berçavên min, ew nêzîkbûnên şaş ji pirsên zimên re ne. Jiber vê bersiva min dê bi çend xalan be.

A - Bêgoman, navlêkirina alfebe vedigere serdema Fînîqîyan. Dibêjin; evî miletî alfebeya pêşî dûzandiye,

Tîpên vê alfebeyê ev bûn (abcdhwzhtyklmns'fsqrst) (ابجد هوز حطي كلمن سعفص قرشت)

ا	ب	گ	د	ه	و	ز	ح	ط
ا	ب	گ	د	ه	و	ز	ح	ط
ا	ب	گ	د	ه	و	ز	ح	ط
ا	ب	گ	د	ه	و	ز	ح	ط

Tîpên pêşî (abcd) jê re bû nav. Bi Erebi tê gotin (ابجد- اجدية). Ji ber tîpa sisiyan (c) bi latîni wek (s) tê xwendin, jê re tê gotin (abeceda, abecedarian, اجدية- اجد).

Li gorî dengên alfebeya kurdî, wê (abcd-abcedî) an (ebced-ebcedî) bê xwendin. Dengê tîpa (c) di alfebeya kurdî de, ji xwendevan re diyar e.

B - Navê din yê alfebeyê (alphabet) ji kû hatiye

Alfebeya Yûnanî ji ber ya fînîqî hatiye girtin û paşê li tevaya oropa belav bûye, bi belavbûnê re guhertin ketine alfebeyê taku

gihiştiye Kurdên vê serdemê.

Navên çar tîpên alfebeya Yûnanî yên pêşî ev in: (Alfa, Bêta, Gama, Dêlta). Ev tîp jî ev in: (α β γ δ)

Navê vê alfebeyê bû (alphabet), tenê navên du tîpên pêşî bilêv dibin.

C - Navê sisiyan ji alfebeyê re

Navê sisiyan ku ji bo alfebeyê bikar tê; (ABC) ye. Wek bi inglîzî (êbîsî) tê xwendin. Dîsa jî, bilêvkirina çend dengên pêşî ji alfebeya wî zimanî ye. Li gorî alfebeya kurdî, ev (ABC) wê (abece) bê xwendin. Ev bilêvkirin dîsa nêzî (ebced) e.

Tevî peyva elifba ya kevna ku dihat û tê xwebitandin, em dibînin ku gelek hemwate yên ebcediyê di zimanê Kurdan de hene û pêwistiya "abe" nîne.

Nivîser çar xalan diyar dike, ku xebitandina peyva (abe) baştir e ji xebitandina peyva (alfebe), û her çar xalên nivîser jî durist in. Lê nivîser pirseke serekî li paş xwe dihêle, û napirse: " Gelo wek nivîser an sazî mafdar e, ku vekîta peyvekê kurt bike, an biguhere? ".

Nivîser dibêje: "...me biryara wê navlêkirinêda". Li cihekî din dibêje: " ji vir û wê ve, emê (abe) li şûna alfebe di çarçewa saziya xwe de bikarwînin".

Ez bawer nakim, ku armanca ciwamêrê Memê Alan ew e, ku zimanekî an şêwezarekî li şêwezaren kurdî zêde bike, û ku ew şêwezar taybet be bi saziya wî.

Ji ber em tev zanin, ku zimanê kurdî zimanê Kurdan e, ne yê saziyekê, jinekê, an nivîskarekî ye. Bêguman bandora herkesî bi ziman daxive heye, û guhertin peyda dibe. Ew guhertin dibe ji ziman re qenc an neqenc be. Heger ew

D. R. 10

NÛSIYA XWENDEKARAN ?!

Anahîte Mûrad

Li pir dever û warên cîhanê yên şaristane, wan ji zû ve nîrxê hiş û ramanên mirov di pêvajoka jiyanê de, nemaze di warê xwendin û zanîne de nas kirine, herweha jî, berên xwe dane demiqurasî, wekhevî û dadmendiye, bê astengî rê li pêş xwendekar û ciwanên xwe dîz û hêsan kirine. Wisan jî xwendekar li gora merem û mîraqên xwe beşê ku, dikare tê de bi serkeve hildibjêre û xwendina xwe dajo serî û kuta dike; Ne jî li gora berhemên ezmûnan û mercên zor dijiwar?!. Vêca jî, ma kî nizane ku ew reng civakan îro di hemû warên jiyanê de li pêş in, çi aborî, konevanî, çandî, civakî û H.W.D be. Ji ber ku hemiwelatîyên wan dewletan hestên rêzgirtinê di hundirê xwe de bilind û bilind dibînin. Lê mixabin û, li vî welatî, rewşa xwendekaran di merc û hoyên zor dijiwar de li ber xwe dide, rîya xwendin û dibistanan li pêş xwendekar bûye deriyê dijîtî, biv û nakokîyan ji ber xem, qisawet û astengên bi lodan, hêmenî û hevpîvanê di hundirê xwendekarên me de nîne. Lewre jî, ji berî çûna ev ton ezmûnên xwekuj xwendekarê reben, di heyameke netundiristî de gêjo-mêjo dimîne, ramanên reş û pir bi biv xwe li wî dipêçin ku, eger ew di vê ezmûna kirêt de bi ser nekeve û pileyeke bilind û berbiçav wernegire, wê bêgûman li mata reş bimîne û tu carî nikare di zanîngehên Sûriyê de cî bigire. Ango cefa û keda evqas sal bin pê dibe. Û bi ser ev rewşa wî ya ne tendurist, dema xwendekar dikeve talarê (qae) û dest bi ezmûnan dike, li hin deveran nemaze li bajarê Heleb beşek ji kesên çavdêran bi sitîlekî dûrî sincên mirovane, di bin perda (teşdîd û xişê) de H.W.D têra xwe terorê li serê xwendekaran dikin?. Mixabin li deverên dî jî, di hundir talarê de serbestî û azadî

çêdibe ! Loman jî, beşek ji xwendekaran bi girî, şîn û melûlî ji talarê derdikevin duhatî û çarenûsiya xwe reş û bê sîd dibînin, encama vê yekê çi li vir û çi li wir pir bûyer û serpêhtî bi êş û jan wek : Xwekujî, bazdana ji malê, nesaxî (dînbûn) li guhên mirov dikevin!. Îsal jî bûyerên ji vê rengî pir balkêş û bi jan weke nimûne : Di rojinama welatê me (Beledine) de ya rojane hejmar -979-rûpel (6) ku , keçeke xwendekar ji berî ezmûnan bi çend rojan di bin bandora hestê tirsê de ku eger ew di reng ezmûn de bi serneke ve wê rû reş û bêcare bimîne .Wisan jî, xwe dikeve !?. Ma gelo ev ton rewşa di warê xwendin û zanîngehan de li tu deveran ji bilî vê welatî hene. Ma çêdibe ku sînor, asteng û mercên giran ne li gor pêvajoka demê be, di rîya ciwan û nîfşên nûgiha de hebin. Ta kengê gelê Sûriyê wê di vê rewşa kambax û wêran de bimîne?. Ev li hêlekê û li hêla dî, di rojaveke weha de bi ser derd û kulan de gelo ew rewşa xwendiyên xwendekar wê çi be û çawa be?. Li gel rewşa bihabûna her tiştî ku piştî xelkê şikestî, piraniyên mirovên Sûriyê qisawet û xemxarên pariyê nanê zariyan û nemaze Kurdên me yên ku di bin nîrê zor û cudahiyê de li ber xwe didin. Ligel wê jî, berên zariyên xwe didine dibistan û korsan ta ku, ew di xwendina xwe de biserkevin û duhatiyeke xweş û geş ji wan re ava bikin. Lê piştî, evqas kefteleft, hêvî û armancên piraniyên ji wan bi mate, pêjin û xewinan re dicirifin û bêtirî ciwanên xwe bi keser û êş dimînin ?!.Loman jî zor pêwîste ku şalyariya perwerdeyê li xwe vegere û ev pîrsgirêkên di warên dibistan û zanîngehên Sûriya me de çareser bikin û li gora demê bimeşin ta hemwelatîyên Sûriyê jî weke hemwelatîyên xelkê dinyayê di heyameke demiqurasî, wekhevî û dadmendiye de zar û zêçin xwe perwede bikin. Bi vî awî Sûriya me wê bibe simbola aşî û xweşiyê , ne wilo ye?!

Dumahîk : Zimanê Xwe ...

guhertin ji aliyê giştî ve hat pejirandin, ji xwe dibe xurtî ji ziman re, û heger ew guhertin veqetandin be. Qonaxa pêşî şelişandinê ji xwendevan re durist dike, û dûvre bi vî rengî şêwezar tên afirandin.

Mirovê nivîskar be, bivê nevê, dixwaze ku ew bê xwendin, û gelek kes tê bigihêjin çi dinivîse. Ji ber vê Peyvan dibijêre û dixebitîne taku xwendevanê wî têbigihêje û nameya wî durist werbigire. Heger ji xwênerên Inglîzî re nivîsand, peyvên Inglîzan dixebitîne, û heger ji xwênerên Kurd re nivîsand peyvên Kurdan dixebitîne. Ziman jibo wê ye ku guhdar (xwêner) tê bigihêje, neku bêjer (nivîser) tê bigihêje.

Heger nivîsarekî an saziyek nivîseran biryar dan, ku şûna peyva Inglîzî (door=dêrî) peyva (dor) bi heman wate bixebitînin. Bêgoman ew biryar nerewa ye û herdem ev peyva (vekîta) nû (dor) mîna şaşiyêke vekîtê wê diyar bibe. Ji ber vê jî tukes biryarê nade, ku vekîta peyveke Inglîzî biguhere.

Yek ji sedemên ku dibêjin zimanê inglîzî û zimanê (şêwezarê) Emerîkî, vekîta peyvên mîna (colour= reng) û (color = reng).

Di kurdî de jî ev cotê peyvan (şaredarî-şarevanî) yan (pêşeroj-paşeroj) bûne kêşe ji zimanê me re.

Bi Farisî peyva (der = di, di hundur de) û bi kurdî (der = derve). Peyva pašeroj li ba hinan (paşeroj= ayînde) ye, û li ba hinin din (paşeroj = dema borî) ye.

Ev peyvên mîna (şaredar, şarevan, pêşeroj pašeroj) şêwezarên kurdî hîn bêtir dûrî hev dikin.

Çima ev rengê nêzikayîyê ji zimanê kurdî re peyda dibe.

1 - Rastiyêke taybet bi nivîskarê Kurd heye, ku bi kêmayî jibilî kurdî bi zimanekî pir baş dizane (Erebî, Tirkî, Farisî), piranî sê- çar zimanan pir baş dizanin. Lê hinin ji wan dixwazin vekîta peyvên kurdî biguherin, yan

alfebeya kurdî biguherin. Belkî rojekê bixwazin çermê me biguherin, ji bo an vekirîtir an tarîtir be.

Belê kesên wisa diramin, zimanê kurdî cuda ji zimanên mirovan dibînin, ev jî encama psykolociya biçûkbûnê ye. Bera em kûr bawer bin, ku zimanê her miletekî li ser rûyê zemînê berhemê zîrekiya mirovane ye, her wisa zimanê kurdî jî.

2 – Di salên sihî de, **Mîr Celadet** alfebeyek, rêziman û xebatên din pêşkêşî miletê xwe kir. Navê wî ciwamêrî bilind bû. Gelek ji me dixwazin wek wî bikin, alfebe, rêziman û peyvî nû çêkin.

Mîr Celadet di serdemeke mêtûyî taybet de dijîya û nema ew serdem tucar vedigere. Ya din jî mirov dikare bibêje ku **Celadet** li gel HAWARA xwe tenê bû û dengê xwe gihand gel, bi kêmayî bi şêwezarê kurmançî. Lê îro bi deh hezarên nivîskar, zimanzan, pispor, zanîngêh û korê zanyarî hene. Bi sedan an bi hezaran alavên ragihandina bêjeya kurdî hene.

Kurd dibêjin "Heçê berê gula zerê". Mîr bû gula zer ya zêrîn. Zîrekên me dikarin ew jî di warekî din de bibin gula xurû zêr, û va babeta yekgirtina şêwezarên kurdî hiş, zîrekî û karê rewşenbîran dixwaze û li meydanê ye.

3 – Dema hin desdirêjiya xebatên Mîr yên durist dikin. Piştî sedsalî hewlîdî alfebeya kurdî biguherin, rêziman diguherin ku şêwezarên kurdî ji hev dûr bibin, Mixabin hin saziyên rêzanî ji ber ne pisporên ziman in, pesindarî û xelatan bi van karên şaş vedikin. Diyar e, ku **xelatên nezaniyê** ne; nezan didin nezanan. Ev coreyên xelatan dibin mij berçavan digirin.

Xurtiya zimanê kurdî îro, di pêvajoya yekgirtina ziman e de ye, alfebe yek be, vekîta peyva kurdî nêzî hev bibe, taku bibe yek vekît. Tiştêk ji gencîneya peyvên kurdî nenas nemîne û peyv ji hemû şêwezaran bêne xebitandin.....

Hêjayî gotinê ye, ku zimanê weşana newrozê paqij e, ji bo ev erk (duristiya ziman) pêk bê, hûn dibînin çiqas nivîserên wê diwestin, ji bo ku vekîta peyva kurdî saxlem (wek ya kurdên din) be. Ji ber vê mirov dikare bêje, ku guhertina vekîta peyva (alfebe) bi (abe), li gel rêbazên weşana we nakunce.

Dumahîk : Ji konferansa..

mirovhezî û rêxistinên civaka sivîl geştir bibin, Kurd jî di van waran de li welatên xerîbiyê xwedî rol û beşdar bin, da ji pirsê gelê xwe re, bibine nûnerên kêrhatî, xwedî zarziman, hêja û hişyar.

Birano , hevalino...

Parta we li welêt di xebata xwe ya rojane de berdewame, û her dê berdewam be, nemaze siyaseta wê ya pîvayî li ba piraniya xelkê û bi taybetî li ba rewşenbîr û hişmendên ciyê rêzgirtinê ye, loma jî, rêxistinên heval û hogirên parta we li seranserê herêmên kurdî û gelek bajarên Sûriyê ên mezin, cî girtine û berfirehtir dibin, û li vê dawiyê, serkeftina lidarxistina kongira giştî ya şeşan a partiyê li welêt digel Bername, Tozik, helwest û belgeyên wê, nîşana vê yekê bû. Hêvî û bawerî li cî ne ku, em tev bi hev re karibin berjewendiyên gelê xwe li Sûriyê biparêzin, li rûmet û mafên wî yê netewî xwedî derkevin, û ligel hêzên niştimanî, demokratîk û rêxistinên civaka sivîl li Sûriyê, mil li mil, di siha Danezana Şamê de xebatê bidomînin.

Asteng û dijwariyên jiyana rojane di siha desthilatiya rijîma parta Bei's de, nebûna qanûnekê bona lisaxistina partiyên, ne jî ew ton hîlbijartinên ku rastiya viyan û dengdana hemwelatiyan berçav bike û bîne holê, bi serde jî diltengî, çavsorî, setem û zordariya hemereng di derbara hebûn û jiyana gelê kurd de..hwd , Vêca ev hemî tiştên he, dihêlin ku, em ji ya xwe nemînin û dengê xwe bigihînin gelê xwe û raya giştî. Lewre jî, hêvî di rêxistina heval û

hogirên li Ewropa, her dê li cî be ku, karibe bi her hawî ji xebata li hundir welêt re, bi alîkar û piştgir be, ne ku hûn beşekin ji siyaseta û avahiya partiyê û hew, lêbelê, li xerîbiyê, hestê mirovahî û gelheziyê dihêle ku hemî heval, dost û piştgir, bi dilsozî û dilên gerim rewş û pêvajoya gelê xwe li welêt bişopînin.

Nimûna karê hevpar di nav Kurdên Sûriyê de li welatên Ewropî, bi beşdarbûna ronakbîr û kesayetiyan serbixwe, di gel rêxistinên partiyên, li ba me, ciyê rêzgirtin û piştgiriya ye. Herweha li Sûriyê jî, parta me ligel parta Pêşveru û bi beşdariya gelek camêr û welatparêzên serbixwe û xwedî rol, karîbû li seranserê herêmên kurd û hin bajarên mezin mîna Şam, Heleb, Reqê û Heseke, Encûmenên herêmî ava bike, da ku bibe pêngaveke hêja li ser riya lidarxistina kongirêkî niştimanî kurdî li Sûriyê ku , nûnertiya jê peyda bibe û ji xebata gelê kurd re bibe lêvegereke kêrhatî, xwedî bername û siyasteke berpirsiyar û pîvayî be.

Di vê çerçewê de, li gor siyaseta û biryarên kongira giştî ya partiyê, em dixebitin û hewil didin ku, rojên li pêş ji guhertineke demokratîk re bin, ji gelê kurd û mafên mirovan re bin, ne ji çand û siyaseta şoven, nijadperest û pişaftina kurdan re bin.

Careke dî, Komîta rêvebir a partiyê bi dil û can, lidarxistina vê konferansê pîroz dike û serkeftinê ji we re dixweze.

Digel rêz û silavan. 17-5-2009 an

**Komîta rêvebir ya
Parta yekîtiya demokrat
a kurd li Sûriyê**

(YEKÎTÎ)

Ristikek ji 52gulan pêkhatî Di stuyê tevgera kurdî li Sûriyê de!

Rêberê Silivî

Bi hatina roja 14ê Hizêranê, 52 sal ji temenê tevgera me ya Kurd li Sûriyê kuta dibin û ew derbasî pênçî û sê saliya xwe dibe. Bêgomane ku demezirandina Partî Demokratî Kurdistan li ser destê hin kurdperwer, rewşenbîr û xemxurên gel û welat di wê roja bi nîşan ji sala 1957an de, ji ber gelek sedeman, gavake dîrokî, giring û Pîroz bûye. Gelê me yê Kurd li seranserî heremên xwe yên dîrokî, çî li Çiyayê Kurmênc, Kobanê yan jî li Cizîrê, rêxistina xwe ya nûhatî hembêz dike, di dil û çavên xwe de wê diparêze û hemî egerên jiyana û pêşveçûnê jê re amade û pêşkêş dike. Gelê me yê Kurd li Sûriyê, bi comerdî, qehremanî û mêrxasî erkên xwe yên netewî Sûrî pêk tîne, ji bo azadî û rûmeta welatê xwe yê hevpişk qurbanên giran datîne. Bi serokatî û rêbertiya lehengê Kurd ê payebilind **Yûsif El-ezme** artêşa Sûriyê a bi rêk û pêk tê damezirandin, paşê, ew bi xwe, li hemberî artêşa Firensî ya dagîrker derdikeve qada şer û li devera Meselûnê jiyana xwe ji dest dide, kevîr, deşt û newalên Meyselûnê bi xwîna wî û ya hevalbendên wî sor dibin, ji gelê Sûriyê bi tevayî re, dibine sembola û nîşana serfiraziyê. Herweha, li heremên xwe yên dîrokî, li kêleka birayê xwe yê Ereb, wî

beşdariyeke bihêz û berfireh di serhildan û şoreşên azadkirina welêt ji hêzên dagirker ên biyanî de kiriye. Herwisa wî beşdariyeke erênî ya berbiçav di avakirin û pêşvebirina welatê xwe Sûriyê di hemî warên jiyana de kiriye.

Lê mixabin, geşbûna ramanên tuxumperstî yên şoven li nik siyasetvanên Ereb û piştire jî serdestiya Parta Bas ku derheqa gelê me yê Kurd pîlanên tunekirin û hilqetandinê ajotine, hebûna wî weke miletekî xweser ku hevparê vî welatî ye dane mendelê, ziman, folklor û toreya wî qedexe kirine û pirojeyên ne mirovane dijî wî pêk anîne.

Tevî perçebûn û rewşa awarte ya tevgera me ya netewî, tevî tîrên jehrîn yên ji hawîr ve dibarin û di laşê wê de li ser hev dişkin, tevî gef, dek û dolabên xapînoker ên rijêmê, tevî ne baweriya me bi vê rewşa belavbûnê, bawerî û hêviya me li cî ye ku berê gel û tevgera me li pêş e. Bêgoman, tevî evqas rêl û kelem û dijwarî, bê dudilî ewê ber bi armancên gelê me ve here.

Di vê bîranîna pîroz de, gurzek gul ji giyanê damezrêner û hîmdarên vê tevgerê re diyarî dikin û em nav di keç û lawên gelê xwe didin, bila ew bêhêvî nebin, û her berê wan li pêş û serê wan li jor be, ji ber ku bêhêvîtiya mirovan mirina wan e.

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*